# Kontrol / Rênîşan / Dem “Zarok piştî dibistana serete divê biçe kîjan dibistanê?”

Bielefeld Bildungsregion

→ Piştî dibistana serete dema derbasbûna sinifa pêncan (pol 5) divê hûn çi bizanin?

| | |
|---|---|
| **27.10.2022** | Çalakî "Piştî dibistana serate kîjan dibistan?" |
| **11/12 -2022 bis 01-2023** | **Li dibistanên navîn, Rojên vekirî ji bo agahadariyan**<br>**→ Rênîşan:** Hûn dikarin agahdariyên ji bo demê/dîrok li vir bibînin www.bildung-in-bielefeld.de yan jî (-> Dibistanên Bielefeldê profîlên xwe li ser malperên xwe ya înternetê didin nasandin. |
| **16.01.2023-20.01.2023** | **Li dibistanên seretayî karnameyê nîvsalê tên dayin** |
| | Dema dayina **formên qeydkirina** dibistanên şaredariyê<br>Hûn ê ji dibistana seretayî ya zarokê xwe forma qeydkirinê bistînin. Ji kerema xwe re wê formê dagirin / binivîsin û bibin li dibistaneke navîn ya bajêr ku hûn dixwazin zaroka/ê xwe lê qeyd bikin. |
| | → Heger hûn bixwazin zaroka/ê xwe li dibistanek taybet (privat) hûn ê ji bo dibistana taybet formek qeydkirinê bigirin û dibistana taybet wê/dê ji bo pêvajoya qeydiyê wê agahdar bike. |
| | **Ji bo hilbijartina dibistanên navîn hinek şîret**<br>Realschule, Sekundarschule, Gesamtschule, Gymnasium = Weiterführende Schulen = SEK I- Schulen = Klassen 5-10<br>**→ Şîret:**<br>• Ji bo biçe kîjan dibistana navîn li pêşniyara dibistana zarokên xwe baldar bin!<br>• Ji bo konsept / plana dibistanê ya pedagojîk pêdiviyên zarokê we çi ne?<br>• Li gorî dîtina we kîjan dibistan wê karibe bêtir ji bo zarokên we baştir be?<br>• Roja hûn ji dibistana navîn çûn dibistanê “roja deriyê vekirî” li ser we û zaroka/ê we bandorek çawa çêbû?<br>• Rêya dibistanê? Çûnhatina rêya dibistanê ji bo zaroka/ê wê hêsan e û ewledar e?<br>• Dibistan tevahiya rojê ye yan jî danek / nîvê rojê ye? (Lênerîna piştî nîvroj heye?)<br>• Dibistan ya şaredariyê/dewletê an jî ya taybet / husûsî ye?<br>• Heger hûn dixwazin zaroka/ê xwe bişînin dersa zimanê dayikê, ji kerema xwe ji dibistana navîn derfetên agahiyê bistînin. |
| **06.02.2023-03.03.2023** | **Dema qeydkirinê li dibistanên navîn ên şaredariyê**<br>Qeydkirina pola pêncan ya sala xwendina 2023/24 an divê di zûtir demê de bê çêkirin.<br>08.02.2023 / 09.02.2023 saet ji 09.00 – 12.00 heta 16.00 – 19.00 an<br>0.02.2023 / 13.02.2023 / 14.02.2023 saet ji 09.00 – 12.00 an<br>**Ji bo paqijî û navbeynê / dûrahî qaîdeyên niha heyî derbasdar in, ku derfet hebin, ji bona cîvanê (Termin) divê hûn berî çûyinê ji xwe re demê veqetînin û li gorî wê biçin qeydkirina dibistanê.** |
| | → Ji bo dema / dîroka rojên qeydkirina li dibistanên şaredarîyê yanî dibistanên dewletê ji bo û yên li dibistanên taybet/xusûsî, ji kerema xwe re ji wan dibistanan bipirsin. |



Ji bo guhertina dibistanê agahiyên zêdetir ji vê navnîşanê bistînin:

# Kontrol / Rênîşan / Dem "Zarok piştî dibistana serete divê biçe kîjan dibistanê?"

Bielefeld Bildungsregion

→ Piştî dibistana serete dema derbasbûna sinifa pêncan (pol 5) divê hûn çi bizanin?

<table>
<tr><td></td><td colspan="2">

**Qeydkirina li dibistana navîn**

Qeydkirin li buroya / sekreteriya dibistana navîn ya têkildar tê çêkirin.

→ **Ji bo qeydkirine divê hûn bi xwe re çi bibin?**

- ✓ Qeydiya hatiye nivîsandin (→Hûn ê ji dibistana serete formeke qeydê bigirin)
- ✓ Pêşniyara ji bo dibistana navîn ji dibistana serete ji bo zarokên we nivîsiye û karnameya dawîn ya di 6 hevyên dawî de girtiye (pola/sinifa 4 an)
- ✓ Belgeya jidayikbûnê (Geburtsurkunde) ya zaroka/ê we ku wê li dibistana navîn were qeyd kirin.
- ✓ Heger hebe: belgeya şiyana zarokê we ya avjeniyê.(-> mînak nîşana avjeniyê)
- ✓ Deftera derzîlêdanê / karta vakslêdanê ya ji bo parastina ji bo nexweşiya sorikan.
- ✓ Heger hûn yan zarokên we bixwazin beşdarî dersa zimanê dayikê ango zimanê zikmakî bibe, divê hûn wan ji bona dersa zimanê dayikê jî cihê qeyd bikin. Li dibistanan li ba sekreteriyê form/kaxeza qeydiya zimanê dayikê heye.

Ji bo dersa zimanê dayikê agahiyên zêdetir:
</td></tr>
<tr><td>

**ji 06.03.2023**
</td><td>

**Biryara** ku zaroka/ê we dê li dibistana navîn bê **qebûlkirin** yan na, piştî bidawîbûna dema qeydkirinê di zûtirîn demê de wê ji we re bê ragihandin.

Ji bo vê mijara qebûlî an neqbûliyê qeydiyê hûn ê ji dbistana navîn agahdariyek nivîskî bistînin.
</td><td>

→ Heger zaroka/ê we dibistan ku we hilbijartiye bi cih nebe (mînak ji ber ku li dibistanê cih tunebe) wê ji vê dibistanê ji we re hişyariyek redkirinê û ya orîjînal kaxezaa qeydkirinê ji we re bê. Bi vê belgeya redkirinê û forma qeydkirinê hûn dikarin zarokên xwe li dibistaneke navîn din ya qeyd bikin.

Ji bo ku li kîjan dibistanên navîn cih heye, hûn dikarin ji malpera internetê ya şaredariya bajarê Bielefeldê bêtir agahdariyan hîn bibin. (→ www.bielefeld.de)
</td></tr>
<tr><td></td><td colspan="2">

**Heqê rêya xwendekaran / Karta xwendekaran ya Westfalen**

Di 1ê sibata 2023 an de (nîvsala xwendinê ya duyemin) dê kartên xwendekaran / kart-biletên dibistanê wê bên firotin. Li piraniya dibistanên şaredariyan, bilêta xwendekaran bi ya Westfaliya hatine guhertin. Bilêta xwendekar ya nû Westfalen tenê dikare bi rêya/navbênkariya dibistanê bi forma wesandinê bêkêmasî were tijekirin yanî nivîsandin û serlêdan bê kirin. Ev bilêt/karta rê ji hemû navgînên veguheztinê yên gelemperî (ÖPNV) yên Westfaliya derbasdar e. Bilêt bêsînor, ji bo hemû saetên rojê yi xwendekarên rewşa wan guncaw bin ji bo tevahiya sala perwerdeyê/xwendinê dibe. Heqê Bilêta xwendekaran ya Westfaliya, para ku xwendekar bidin, mehê/heyvê 12 € ye (ji bo keseke/î 6 € ye lê ji bona xwûşk û birayên din yên ji heman malbatê bêpere/dirav ango belaş 0 € ye). Xwediyên pasaportek Bielefeld ya niha derbasdar / li gorî biryara SGB II / biryara SGB XII an jî biryarek ji bo penaberan ku mafê wan ê lêçûnên rêwîtiyê ji bo xwendekarên dibistanê heye dê bilêta xwendekariyê werbigirin belaş e. (Mixabin, tenê belgeya perwerdehiyê wekî delîl têrê nake/nayê qebûlkirin.)

Ji bo hemû kesên ku ne xwediyê heqê rêwîtiya xwendekaran ne û ji ber vê yekê mafê wan yê destekgirtinê tinene, divê heqê bilêta rêwîtiyê ya xwendekaran ya Westfalen ew bi xwe ji kîsê xwe bidin. Heqê Bilêtan Xwendekaran ya Westfaliya mehane di navbera 30 - 36 Euro de ye. Niha (rewş: 27.10.2022 hîn tam ne sabit e.) Form/kaxeza ji bo bilêtê divê bêkêmasî bê nivîsandin û ji dibistanê destûra pejirandin/qebûliyê bê stendin û serlêdan li ba fîrmaya veguheztinê bê kirin.

➜ **Rênîşan:** Hûn dikarin agahiyên hîn bêtir di belavoka yanî di broşura 'Mesrefên Rêwîtiya Xwendekaran ango heqê rêya xwendekaran de bibînin (ev agahdarî li buroyên dibistanan jî hene) an jî li ser înternetê www.bielefeld.de hene (peyva sereke: Perwerde / hemû li ser mesrefên rêwîtiya dibistanê / xwendekar) ji Kanûn 2022 an û pêy ve.
</td></tr>
<tr><td>

**07.08.2023**
</td><td colspan="2">

**Di sala 2023 an de roja yekem 1. ya destpêka dibistanê ye**

**Pîroz be! Zaroka/ê we di jiyanê de qonaxek nû dest pê dike!**<br>**Em ji we re serkeftinê dixwazin û kêfxweşiya fêrbûnê bijîn!**
</td></tr>
</table>



Ji bo guhertina dibistanê agahiyên zêdetir: